

Qutbûna ceryan/elektrîkê piştî lehiyê

Zanyariyên ser qutbûna ceryanê piştî lehiyê

Kurdish Kurmanji | Kurdî Kurmancî

OFFICIAL

Dibe ku hindek dem bikişîne ku ceryan piştî lehiyê vegere. Têbîniyên jêrîn li ser wan tiştan bi kar bînin ku dikarin bikin eger qutbûneke ceryanê hebe.

Têbîniyên li ser ewle parastina xwarinê

- Qutbûna ceryanê dikare bandorê li xwarina we bike, ji bîr nekin:
 - ✓ xwarinê ji sarincokê bibin cemidankê
 - ✓ xwarina xwe heta ku mimkin e bi danîna kîsikên qeşayê yan jî betaniyeke îzolekirinê li ser pakêtên xwarinê sar bihêlin
 - ✓ eger xwarina we hîn jî sar be (ji 5 °C kêmtir), xwarina wê ewle ye
 - ✓ eger xwarina we êdî sar nîne, dikare heta çar saetan were hilanîn û xwarin û paşê divê were avêtin an were pijandin û were xwarin.
 - ✓ xwarina germ di nav çar saetan de ku germ bû bixwin, an jî biavêjin
 - ✓ eger ceryan wê demê vegere ku xwarina cemidî hîn hişk be, wê hingê xwarin ewle ye ku ji nû ve were cemidandin.

Têbîniyên li ser bikaranîna jeneratoreke ceryanê

- Dema ku ceryan qut dibe jenerator bi gelemperî tîn bikaranînin. Berî ku hûn yekê bi kar bînin van têbîniyan bi kar bînin:
 - ✓ piştrast bin ku jeneratorên neftê yan mazotê li cihên derve yê ku hewa wan diguhere bi kar bînin ji ber ku ew dikare bibe sedema jehrîbûna karbon monoksaydê ku dikare we pir nexweş bixe.
 - ✓ portabl an jeneratorên bo bikaranîna derve li hundirê xaniyê we nayên xebitandin ji ber ku ew dikare bibe sedema jehrîbûna karbon monoksaydê, şoka ceryanê yan agirpêketinê
 - ✓ jeneratorên hertimî dayînin ji ber ku ew bo çêkirina ceryana piştevan baştir in
 - ✓ jeneratora xwe li cihekî ziwa xwedî bikin. Divê hûn neftê li derve li cihekî parastî xwedî hilînin
 - ✓ berî ku dest bi jeneratorê bikin destên xwe ziwa bikin
 - ✓ berî ku hûn vekin kontrol bikin ku tîl an sazgehên din ên ceryanê xera nebûbin
 - ✓ berî têkirina sotemeniyê jeneratorê damirînin û sar bikin. Petrola ku li ser perçeyên motorê yê germ tê rijandin dibe sedema agir
 - ✓ bi tîleke dirêj a erkên giran dezgehan bi jeneratorê ve bikin
 - ✓ Hewl nedin bi girêdina jeneratorê di dergeheke dîwêr de ceryana xênî dabîn bikin.

Alîkariyê wergirin

- Ji bo zanyariyên li ser bikaranîna ewle ya gaz an ceryanê bi Energy Safe Victoria re bi 9203 9700 têkilî dayînin an binêrin: www.esv.vic.gov.au
- Ji bo raporkirina têtçûna gazê ji 132 771 re telefon bikin.

Bo wergirtina vê belavokê bi formatê guncaw, emailê bişînin pph.communications@health.vic.gov.au